



MAHÎR ÇAYAN - NIVÎSÎNÊN BIJARDE

Ji bo bîranîna Hüseyin CEVAHİR

WERGÊR: Dildar ŞEKO

Eniya Şoreşa Rohilata Navîn - Ofîsa Çapemeniyê



MAHÎR ÇAYAN - NIVÎSÎNÊN BIJARDE

PÊŞGOTIN

Têkçûna hevsengiyên berê û damezrandina hevsengiyên taze yên li welatê me û li rohilata navîn, cenga parvekirina ser ji nuh de ya li navbera rikaberên emperyalîst ku li ser erdnîgariya rohilata navîn bi hemî tundiya xwe ve didome, ew bi xwe di sedsaliya 20`an de, bi peymanana Sykes-Picot di navbera hêzên emperyalîst de hatibû parvekirin.

Ji aliyekî din ve; dewletên desthilatdar yên rohilata navîn ku pi tî wardema sêyemîn bi azînen nuh yên mêtîngeriye bi emperyalîzmê ve hatine girêdan, her yek ji van hevkarên hêzên emperyalîst li her cihê ku dihête parvekirin, bi nirxekî herî herzan xwe pê ke î bazara efendiyên xwe yên emperyalîst dikin û li cihên ku dihêne parvekirin li dût daxwaza hêzên emperyalîst rola xwe ya hêri karî û dagîrkeriyê bi cih dihênin.

Di destpêka çaremîn wardema qeyranê, digel rûxîna dîwarê Berlînê ya di 1989`an de serûbinbûna mêjûyî durist bûye, parvekirina ser ji nuh de ya rohilata navîn û tevaya mêtîngehan hatiye ragehandin. Di encam de Sûrî, bi amanca bidestxistina serdestiyê ya li hemberî hev bûye gorepana herî nazik ya erekî germ ku bi hemî tundiya xwe ve li navbera rikaberên emperyalîst didome.

Di van rûdanan de û di van rojên ku rohilata navîn bûye kemberek ji agir, êdî hîç girîngiyêke sînor û dîwarên dihêne bilindkirin nemaye. Gelên me yekem serkeftina pêkanîna kembera ore ger wekû rohilata navîn bi dest xistiye. Ji bo zêdekirina xelekên taze li ser vê ore û serkeftinê, erka ku dikeve ser anên ore ger û sosyalîstên welatên dîtirî rohilata navîn, zêdekirina xelekên taze ye bi ser xelesa serkeftî ya ku hatiye bidestxistin.

Guhertina çarenûsa gelên me ya li vê erdnigariya ku bi sedsalan e ji aliyê emperyalîzmê ve dihête talankirin, ji bo ore eke herêmî ceng û hevgirtin divêt. Ji bo damezrandina rohilata navîn ya ore ger li pê berî me hîç astengiyek tune. Çerxa mêjûyê êdî di berjewendiya gelên me de disûre.

Her wisa, bi wergerandin û we ana nivîsînên bijarde ya bi zimanê kurdî ku ji nivîsînên teorîk, bîrdozî yên ramyarê le kerî-polîtîk Mahîr ÇAYAN pêkhatine, em dilxwe î û serfiraziya xwe digel co eke bêhampa bi gelên xwe re parvedikin. Nivîsînên bijarde ku ji hemî nivîsînên Mahîr ÇAYAN hatine berhev kirin, bi vê wergera kurdî yê ku di kameranî û dilxwe iya me de alîkar bûye û her wisa xwedî kedeke herî mezin e, em çend sipasiya hevalê xwe yê hêja Dildar EKO bikin dîsa jî têrê nake.

Evê xebata ku ji hemî nivîsînên Mahîr ÇAYAN hatiye berhevkirin û yekemîncar bi navê -Nivîsînên Bijar de- wergera wê ku mîna pertûk bi kurdî hatiye çapkirin, ji bo bîranîna Huseyîn CEWAHÎR ku di 1`ê Hîzerana sala 1971`an de li navçeya Maltepe ya bi ser parêzgeha Îstanbûlê di er de ehîd ketiye, dihête pê ke kirin.

Ev nivîsînên bijarde ku bo kurdî hatine wergerandin, ji pergala nivîsînên partiya me (Enî- Partiya Rizgariya Gel ya Tirkî)THKP-C yên teorîk û bîrdozî hatine berhevkirin. Her wisa, ji bo me û ji bo tevaya gelên welatên mêtîngeh hîna jî xetîreyeke ronîdayî ye li ser rêya me ya ore gêrane

HETA BI RIZGARIYÊ CENG

HER BIJÎ CENGA RIZGARIYA GELÊN ME...

19 SIBATÊ 2019

THKP-C/MLSPB